
# NEWROZ



Dr Nûredîn Zaza
1919 - 1988



Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo : * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya wel[êt de .

Ji *weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê - YEKÎTÎ*

*Email :* Newroz95@hotmail.com

**Hejmar (83) B.Çile 2008 z-2620 k Buha (15 ) ps**

# Daxuyaniya dawî
# Ya karûbarê kongira şeşan a normal a parta yekîtî ya demokrat a Kurd li Sûriyê


**L**i dawiya meha Çiriya duyem 2008 an , kongira partiyê bi serkeftî lîsta karê xwe bi dawî anî . Ji berî hîngê , nûner hatibûne helbijartin , û pirojeyên belgeyan - di nav de tozka hundirî ya ku civata fereh a li ber deriyê lidarxistina kongirê li ser erê kiribû - hatibûne belavkirin . Herweha piroja bernama siyasî ya partiyê û rapora siyasî , yên ku bi firehî hatibûne şirovekirin û hinde têbîn û guhartin tê de cî digirtin , digel pêdiviya ji nûlêkirina raporê di warên navnetewî de .

**D**i şirovekirina rewşên hundirî welêt de , kongirê nêrîn û siyaseta partiyê rast didît û dipejirand , nemaze siyaseta ku berê wê lê ye ku hemî hêz û çalakî bêne serhev , bona pêkanîna ji hevekirineke siyasî ku di xizmet doza guhartina niştîmanî ya demokratîk keve , da ku sînorek ji sîstema desthilatiya ketûber re , ji rijîma tekpartiyê re bête danîn , ev rijîma ku timî nerindiyan dafirîne , tîne holê û nû dike , digel dizî , alozî , û tepsandina bi darê zorê . Lewre jî , kongirê zor pêwîst didît ku , piletforma danezana Şamê bête parastin û nûjenkirin , bona avakirina dewleteke normal û modêrn , ku zagon û qanûn , di ser hemiyan re be . Zarzimanê diyalog û gotûbêjan ligel hemî hêzên siyasî û civakî , bingeh û rêbaz be .

**P**êdivî û gerekiyeke jiyana mirovahî û şaristaniyê ye ku , quretî û bikaranîna darê zorê ciyê nefret û şermezariyê be , da ku lihevkirin û aştiya civakî bête parastin , rê li ber siyaseta jihevcudakirin û rikgiriya li derbarey gelê kurd bête girtin . Ew siyaseta he , ya ku navnîşana wê , ne tenê înkara fermî ji hebûna kurd a dîrokî re û berdewamiya qedexê li dij zimanê dê û hew , lê belê , **D.R. ( 10 )**

www.arsivakurdi.org

# Mamoste Mihemed Nezîr Mustefa
## Sekreterê giştî yê Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê(Alpartî)
## Çû ber dilovaniya Xwedê



Roja Duşembê 22/12/2008an, li nexweşxaneke bajarê Şamê, dilê rêzdar û xebatkarê Kurd ê bi nav û deng (Mihemed Nezîr Mustefa) rawestiya. Roja Sêşembê 23/12/2008an, bi gurzên gulan, bi rondikên ser dêman û hêviyên mezin û giran, li Qamişlo, termê wî hate pêşwazîkirin. Bi hezaran welatparêzên Kurd, Ereb û Asûrî, partî û rêxistinên kurdî li Sûriyê, Rêxistina Asûrî ya demokrat, rêxistinên mafê mirovan û komîtên civaka sivîl digel nivîskar, helbestvan û rewşenbîrên Kurd û Ereb û gelek kesayetiyên xweser… Hemî bi hev re, li pey cendekê mamoste bi rêve çûn ta ew di goristana Qidûr Begê de, li bajarê Qamişlo bi cih kirin.

Rêzdar M.Nezîr Mustefa, di malbateke Kurdhez û welatparêz de xwedî bûye, bi mêrxasî, zanistî û hişmendî wî berevanî di ber doza gelê Kurd a dadmend û rewa de kiriye, li hember pilan û pirojeyên şoven digel hevalên xwe serî hilda ye, daxwaza mafên gelê Kurd kiriye. Lê, wan şoven, zikreş û hiştengan ew bi 8 salan ceza kirin û wî ew sal ji temenê xwe di zindanê de bûrandin.

Gelek gotin û birûsk di rê û resma veşartina termê Mamoste Mihemed Nezîr de hatin xwendin, û li ser qencî, comerdî, zanebûn û mêrxasiya wî bi dirêjî hate xwendin.

Bila serê heval, malbat û merivên wî û serê gelê me bi tevayî sax be û cihê wî buhuşta rengîn be.

Bi boneya koçbarkirina mamoste M. N. Mistefa, rêxistina partiya me li Ewropa behîname ji serkirdayetiya al-partî re rêkiribû. Emê wê behîname biweşînin.

**Yekîtî - Rêxistina Ewropa ya** 28.12.2008

**Behîname**

Hevalên hêja, serkirdayetî û endamên Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê (al-Partî)

Xwîşk û birayên hêja, malbata mamoste Nezîr Mistefa

Me bi dilekî xemgîn û şikestî nûçeya koçbarkirina dawiyê ya xebatkarê hêja mamoste Mihemed Nezîr Mistefa (rehma Xwadê lê) bihîst. Helbet koçbarkirina xebatkarekî weha, ku piraniya jiyana xwe bona gelê xwe yê Kurd û doza wî ya rewa û dadmend terxan kiri bû, ziyaneke mezin û giran e. Ne tenê ji partiya wî re, belê ji tevaya Tevgera Kurd li Sûriyê re. Çunkî ne hertim û ne jî li her ciyekî ew xebatkar peyda dibin, yên ku yekîtiya tevgera xwe û berjewendiya gelê xwe di ser her tiştekî din re digrin. Lewre jî em vê koçbarkirina dawiyê ya mamoste Mihemed Nezîr Mistefa weke jidestdaneke mezin dibînin. Lê yê ku hinekî dilê mera rehet dike ew e ku dawiya jiyanê ji xebtkarên weke mamoste Nezîr re destpêka jiyaneke nû ye. Mamoste Nezîr ne mirî ye, ew di wijdana gelê xwe de zindî ye, ew tev i karwana nemiran bûye. Xwedîderketina keç û lawên Kurd çi li welêt, çi jî li derveyî welêt – li rehmetî vê rastiyê diçespîne

**-Xwîşk û birayên hêja,**

di heman dema ku em ji gelê xwe re, ji Partiya Demokrat **D.R.( 5 )**

# Tewana Kuştinê
# Kiryara hovane…

**Dr : Rozad Elî**

**Di** sala 2008an de bêtirî sî mirovî, jin û mêr, li Navça Efrînê hatine kuştin. Ev jî rûdaweke civakî , mirovane û li navçê pir awarte û nû ye. Şêniyê wê şêtmêt dike û tirseke mezin peyda dike. Ji bilî ku ew dihêle ji hêla her welatiyekî ve li naça.Efrînê û li derbarî bingeh û sedemên pirbûna wan bûyerên hovane, pirsên xemgîn û bi êş were pirsîn.

Erê kuştina mirovan ji berê û ji dema (Adem Û Hewê) ve hebû û dibû û li her navçekê û welatekî tê dîtin. Lê, ew hejmara kuştiyan li gor serhejmara şêniyê navça Efrînê hejmareke mezin û pir bilind e û rûdaweke pir bi tirs û xerap jî datîne ber çavan.

Li gor sedemên yekser û naskirî ji wan bûyeran re, ew parve du cureyan dibin:

**Yek**: Kuştina jinan û keçan. Ew bi behaneya pirsên (namûsê û pakirina şerefê!) tên kirin. Lê, li gor zanînan, piraniya vê kuştinê li ser gumanê hatine kirin û tu nîşanên ne durist li ser endamên govdên ew jinên kuştî nehatine dîtin.

Di vî warî de, gelek tişt hene, rê li ber kuştinê û kuştarên jinan dûz dikin û pêkanîna ew kiryara çepel hêsan û nîv rewa jî dikin. Wek: gedên civakî yên kevneperest û zagonên dewletê yên kevin û nerm di tenga dadkirina kuştarên jinan re. Ev tişt sezaya kuştarên jinan pir hindik dikin û piraniya caran, piştî çend mehan kuştar serbest tên berdan û bi (serbilindî) li civakê vedigerin.

Hejmara vê cureyê ji kuştinê, dora çaryek ji tevahiya tewana kuştinê. Yên ku îsal li navça.Efrînê bûne ne.

**Didu**: Kuştina ji ber sedemêm civakî, aborî, tolvedanî, serserîtî û tiştine din dibin. Tiştê herî balkêş û diyar di van kiryarên kuştinê de, piraniya kuştaran di rewşên serxoşiyê de tên dîtin. Ew meyê vedixin yan jî narkotîkê dibin,û dibin hikariya wan de pêkanîna tewanên kuştinê yên çepel û gelek tiştên pîs dikin.

Kuştinên vê cureyê bi tevahî ji ber sedemên biçûk dibin. Loma jî, çareserkirina wan pirsgirêkan pir gengaz û hêsan e û gelek caran dilferehiyek û lêborînek kanin xwînrêtinê rawestînin.

Di vî warî de, gelek welatî pêçiyan dirêj dezgehên asayişên dewletê li navça Efrînê dikin, û wan di warê zirtkirina gelek xortan de gunehkar dikin.

Dîsa di vî warî de, rola kesên xêrxwaz, gernas û partiyên siyasî xuyan dibe û stubariyên wan ên zor pêwîst dest pê dikin.

Li sala borî 2008 an, cureyeke din û nuh ji Kuştinê li nav Kurdên navça Efrînê hat dîtin. Li gor çavkaniyên asayişên dewletê û sîxurên wan, û li gor zanînên ku alîgirên Partiya Karkirên Kurdistanê PKK jî yên ku ji devê xwe berdidin, ew kuştin ji ber sedemên siyasî hatine kirin. Sedema wan kuştinan ya rastî ne diyar e, lê hejmara wê li navça Efrînê gihîştiye çaran. Yek jê li bajarê Helebê û sisê jî li navaça Efrînê hatine kuştin. Yek ji wan kuştiyan zarokekî sê salî bû û di hembêza bavê xwe de hat kuştin. Dîsa li gor gotinên aligirên PKK, **D.R.(11)**

www.arsivakurdi.org

## Armancên Şerê Geze Çi ne?..

**Xemxarê Welêt**

Berî hertiştî, dema mirov kuştina mirovine din dibîne, hema çawa û kî dibe bila be; Hestên mirovaniyê di wî de dilivin, dil xemgîn dibe û pê dêşe jî. Vêja ne hîn ên tên kuştin ji kesên sêvîl, zarok, jin û kalemêran bin; Wê hîngê êş û xemgîniya morov her dere pirtir dibe. Wê lomê em bi vê şerê Gezê ne razîne, em wê şermezar dikin, û dibêjin : Bi çi awayî dibe , gerek were rawestandin. Ji ber ku ev şer di navêna leşkerê Israîl û Tevgera Hemas – ew ê ku li nav xelkê Gezê yê sêvîl -de ye, û di rewşeke weha de, piraniya kesên têne kuştin û tarûmarkirin, zarok, jin û kalemêr in .

Di baweriya me de, ev şer ji xwe berê pêk nehatî, belê pir sedemên ku hîştine pêk were hene, herweha pilankirinek ji mêj ve jê re hebû, û armancên dûr û nêzîk jî yên wê hene, EW jî bi kurtahî ev in :

- Armancên nêzîk û yekser : 1- Divê saroxên Qesam û Girad yên ku Tevgera Hemas davêje Isra,îl werin rawestandin. 2- Divê derbasgehên di navêna Misir û Gezê de, di bin çvdêriya hêzên nevnetewî de bin, yanê ew nemînin ciyên derbaskirina çekan ji Tevgera Hemas re.
- Armancên dûr: 1- Kokirina rola hêzên Islamî yên hişkbawer, mîna Îran, Sûriyê, Hizib-Elah , Tevgera Hemas.... û H.W.D, li Rojhilatanavîn. 2- Geşkirina rola hin dewletên dî li herêmê, mîna Turkiyê, Isra,îl, destlata Felestînî ya rêdankirî, û dibe di paşerojê de ji nû ve rola Îranê jî jê re vegerînin.

Yanê ji nû ve, pirojeya Rpjhilata Navîn a nû nûjen dibe, û belkî rojek bê, tu rol dewletên Ereb nemîne, û tevger û hêzên Islamî yên bawerhişk wek entîkan bibin.

Li dawî em bawerin, ku Isra,îl û Felestîn hevcîwarê hev ên rasteqînin, divê bi aştiyane weke du dewletên cîran, îro û sibe jî bi hevre bijîn. Û em bawerin jî, Ku ev şer nayê rawestandin, bêyî ku bi kêmanî , ew armancên nêzîk û yekser bi cî werin.

Dîsa li ber roniya nêrîn û helwestên me yên jorîn, em deng û banga xwe tevî yên doza rawestandina şer dikin dikin. Ji ber ku em hertim haval û piştgirê aştî û hêminiya cîhanê – bi taybetî Rojhilat**a** Navîn **-** tev in.

## Fermana 59an a 2008 an

Tiştên em zanin li welatên li pêş demoqrasî û mirovên wê maf parastî ne. Ne ji mafê tu hêz ewlekariyê ye ku, mafê tu kesî bin pê bike û biqoprîne an sînorên wî derbas bike . Eger li hin ciyan bibe jî , ew kes dikare giliyeke xwe ye sezayî li pêş dadgehekê, li wê hêza ewlekariyê rake.

Li Sûriyê, erê mafê gilîhildanê li dijî hêzên ewlekariyê -mîna emin eldewlê ,emin eleskerî,emin elcewî û emin elsiyasî ne ji mafê tu kesî bû. Yanê ji mafê wan hêzan bû ku, mafê çi kesî be bin pê bike û her sînor û xêzên sor jî derbas bike.Lê, wî kesî nikarî tu gilî sezayî bikra. Herweha mersuma jorîn, ev rêdan da hêza polîsê (şurta) û gumrikê jî. Yanê wek hêzên ewlekariyê yê nberê,kanin destdirêjiyan di mafên pîroz yên her welatiyekî de bikin .Ew jî nikane giliyeke sezayî di riya parêzerekî re li wan veke û doza mafê xwe bike, berî ku erêkirineke pêşda ji şalyarê bergiriyê bibe.

De ka, em ji serokomarê Sûriyê -xudiyê vê mersûmê- bipirsin ka sedemên vê mersûmê çi ne? Çi tişt evqas pêwîst heye ,hşt hûn van destdirêjiyên zêde bidin van hêzan? Û bi çi mafî hûn hemwelatiyên vê welatî yên bêçare ,bê maf û serdaxistî dikin?.

www.arsivakurdi.org

# Dermanekî nû ji bo jidestana giraniyê, ezmûnên xwe yên dawîn derbas dike

Li gor rojnama Emerîkî “Healthy Daily News – Nûçeyên Rojane yên Tendurustî”, dermanekî nû bi navê LORKASÊRÎN, di ezmûnanê de ye, ew derman encamine hêvîbar ji bo kêmkirina giraniya mirov diyar dike. Lêkolînvan hêvî dikin, ku ew dermanê dê bibe çekeke nû li hember pirsgirêka qelewbûnê ya ku li seranserî cîhanê peyda bûye.



Gewretirîn zanyarên Kompaniya Arîna ji bo pêşesakirina dermanan li Bajarê Sandiyêgo – Emerîka dibêjin, di lêkolîna ku li ser wî dermanî hatiye kirin de û bê ku parêzî û werziş werin bikaranîn, giraniya mirovên ku ew derman bikar anîne zû dageriyaye.

Lêkolîn dibêje, 469 jin û mêrên ku nîşana girsiya govdeyên wan di navbera 30î û 45an de bû, xwe xistin bin lêkolîn, ew kes li gor tibaba dermanê ku dibirin parve çar koman bûn, komek jê xapînek bû. Di encama ezmûnê de diyar bû ku giraniya wan bi radeke pir baş daket. Pîvana nava wan û tibaba Kolîstrol jî di xwînê de daket.

Nûçe dibêje ku ew derman derbas pêngava ezmûnî ya sisiyan bûye, û eger ew wê pêngavê jî derbas bike, kompaniya dê daxwaznamekê pêşkêş Kargêriya Derman û Xwarinê ya Emerîkî bike daku wî wek dermanekî nû tomar bike.

Rapora rojnamê dibêje ku pêdviyeke îjdil bi “çekek nû” ji bo bergiriya rûdawa qelewbûnê heye, ku dusêyek ji gelê Emerîkê toşê bûne. Wek tê zanin, ew qelewbûn jî, pêşepirsine tendurustî yên giran çê dike, jê janên dil, ziwabûna xwînberan, celta û cureyê diduyan ji jana Şêkir.

Erê bikaranîna bernameke parêziyê û rahênanên werzişî jî kanin qelewbûnê ko bikin. Lê, pir hindik ji kesan kanin wan guhertinan biparêzin û nehêlin ew giraniya ku jidest dane vegere. Ji bilî ku hin dermanên ku roja îro ji bo jidestana giraniyê bikar tên, hinek ziyanên xwe yên naskirî hene. **CNN**

## Dumahîk: Behîname

a Kurd li Sûriyê re û ji xwe re – weke Rêxistina Ewropa ya Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê – dibêjin: bila cihê rehmetî Buhuşt be û serkeftin jî ya doza me ya netewî û demokrat be. Û dixwazin bînin bîra me tevan ku xwedîderketina li xebatkar û nemiran tenê bi xwedîderketina li bawerî û bîrdozên wan dibe. Loma jî ji me hemû heval û hevriyên nemir têtе xwestin ku em rojekê zûtir li xwe vegerin, berjewendiyên bilind yên gel û tevgera xwe di ser hertiştekî din re bigrin, da ku em hemû bi hev re kari bin yekîtiya Tevgera Kurd û avakirina lêvegereke kurdî di demeke nêzîk de ji gelê xwe re, ji xebtkarên zindî û ji şehîdên xwe re bikin mizgîn. Ev berpirsiyariyeke me li hember gel û nemirên me ye. Tenê bi vê yekê em dikarin xebata xwe ya li pênawî avakirina sûriyeke demokrat, ku tê de hemû mafên netewî yên gelê me bêne bidestxistin, xurt û berhemdartir bikin.

Li dawiyê em, weke Rêxistina Ewropa ya Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê careke din sersaxiyê ji malbata wî, partiya wî, tevgera kurdî û tevaya gelê Kurd re hêvî dikin û dibêjin: Bila ciyê wî her Buhuşt be. Serkeftin jî helbet dûr an nêzîk ya doza gelê me ya netewî, demokrat, rewa û dadmend e.

**Komîteya Serkirdayetiya Rêxistina Ewropa ya Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê - Yekîtî**

www.arsivakurdi.org

# XWE JI BAVÊ XWE VEDIZÎ TERKA GUND Û MALA XWE DA

## DA KO HÎNÎ XWENDIN Û NIVÎSANDINA ZIMANÊ XWE BIBE

Ne çîrok, ne dîrok, ne jî efsane ye. Eyn rstî û heqîqet, biserhatiya xortekî Kurd, xortekî kurd î hêja ye. Belê, ji bona ko bikare hînî xwendin û nivîsandina zimanê xwe bibe, xwe ji bavê xwe vedizî, bavê xwe xapand, ji gundê xwe rabû û çû Amûdê.

Xwendevanino! Guh bidine min, honê bibînin ko di van gotinan de tu mubalexe, tu zêdekirin nîne û ev xwerû rastî, rastiyeke rût û tazî û dijwar e.

Ma dinya ne remezan e, ez bi derengî çû bûm çapxanê. Li çapxanê, ji zilamên adetî û heroyî pêve xortekî xerîb jî hebû. Xort li ser kursîkî çapxanê î lingşikestî û hesîrdiryayî rûniştî bû, ji ber min ve rabû. Min silav li xelkê xwe û li wî kir û min cihê wî ji nû ve şanî wî da. Xortê xerîb rûnişt. Di çavên wî de pêt û çirûskên jîriyê diçirisîn, di her hal û lebtên wî de ew edeb û terbiya kurdmancî a zikmakî dihate dîtin. Min jê re got:

-Xortê qenc min tu nas ne kirî, tu ji kû yî?.

- Ezbenî ez ji dora Dirbêsiyê, ji gundê Tilêlûnê me.

Min hinekî din pê re xeber da, min dît ko zarê wî ne zarê beriyê ye, dîsan min got ê:

-Tu dibêjî ko tu ji Telêlûnê yî, lê zarê te ne zarê beriyê ye.

-Ezbenî xebera te ye, esilê me ji Wartoyê ye ji gundê Qerekan, em bi xwe cibrî ne. Navê min Cengbazê Cibrî ye, kurê şêx Mehmûd. Ev bûne deh sal em ji welêt hatine. Gava em ji welêt derketine ez neh salî bûm. Bavê min seyda ye, di gundê Telêlûnê de dersa feqehan dibêje.

Min dîsan ji xortê xwe pirsî:

-Tu zanî bi kurdmancî bixwînî?

-Ma çawan nizanim ezbenî. Hergav Hawar ji min re têt. Lê hetanî ko ez hînî xwendina zimanê xwe bûm min gelek zehmet dît.

-Ma çire? ji elfabeya me hêsantir kêm elfabê peyda dibin.

-Zehmet ne di elfabê de bû.

-Lê di çi de?

-Ezbenî tu dixwazî ezê çîroka xwe ji te re bibêjim.

-Ma çawa naxwazim, kerem bike bibêje.

-Ezbenî beriya niho ji gava Hawar derketi bû ez pê hesiya bûm. Lê hingê ez piçûk bûm û min nikarî bû ez ji xwe re tevdîrekê bibînim û hînî xwendina zimanê xwe bibim. Xwedê fikira miliyetê, ji berê de di min de çêkiriye. Lê min zehf dixwest yên ko bi vê meselê dixebitin û pê hesiyane ez bi wan re hevaltiyê bikim û feydekê ji wan bibînim. Lê belê ba me li gund yên ko bi navê kurdîtiyê têne ban kirin û bi xwendina kurdiyê dizanin nînin. Hawar jî ji nû ve derketi bû. Min she kir ko li Amûdê hin ji vî qismî hene. Ba me adet e feqeh di gundên xwe de dest bi xwendina ilmê erebî bikin ji paşê diçin gund û bajarine din. Ji ber ko dibêjin heger feqeh ji mala xwe bi dûr ket û çû xerîbiyê **D.R.( 7 )**

**Dumahîk: XWE JI BAVÊ XWE ....**

çêtir dixwîne. Îcar min çi kir, min izna xwe ji bavê xwe xwest ko herim Amûdê û li cem seydayê Evdilhelîm ilmê erebî bixwînim. Lê mexseda min tiştekî din bû..

Min ştexaliya xortê xwe li hire birî û jê pirsî:Ma çire ev derew. Te çire ne got bavê xwe ko tu herî Amûdê da ko hînî xwendina kurdiyê bibî?. Xortê min bi kenê xwe ê şêrîn kenî û got: Ezbenî min ji bavê xwe re rastî bigota tucaran izna min ne dida. Ewê ji min re bigota ma tu dixwazî kafir bibî. Axir serê te neêşînim, bi vê derewê ez çûm Amûdê û bûm feqehê seydayê Evdilhelîm. Rojê saetekê li cem seydayê xwe rûdiniştim, ewî jî dersa min digot. Wekî din temamî wextê xwe li nik hevalên xwe ên kurd û kurdparêz dibihart. Li Amûdê li ba Hişyarê Licî bi kurdî elimîm û gihaştim daxwaza xwe. Tu dibînî ezbenî çire xwendina kurdiyê zehmet e. Ne ji ber herfên wê lê ji ber mezinên me.

Min gote xortê xwe: Niho tu bi xwe seyda yî, seydayê kurdiyê. Di gundê de xelkê xwe hînî kurdiyê dikî?

-Gelek hindik û dizîka. Xort dixwazin hîn bibin lê ji mezinan ditirsin.

-Ma ew mezin kî ne?

-Ma tu bi xwe nizanî ezbenî, şêx û axa.

Min ştexalî li hire birî, ji ber ko xortên ko guhdariya vê ştexaliyê dikir dest bi çêr û dijûnan kiri bû.

Ez vê çîrok biserhatiyê berpeyî şêx û axayên xwe dikim û hew. Heçî zane ji xwe zane, heçî nizane…

Her bijî Cengebazê Cibrî, Xwedê te bihêle yên wek te di nav miletê kurd de zêde bike.

**RONAHÎ- Hejmar 7- Pêncşemb- 1 Çiriya Pêşîn 1942-Rûpel 7/(115)**

# Ji bîranên zarotiytê…
# RIŞTA

**Dilêrê Kurd**

**H**îna ez biçûk bûm, temenê min heft sal bû, dema li gundê me dibû cejin yan sersal, dayika min dihelçeniya, dikir şabaş û digot:

Gelî biçûkan, gelî mindalên min ên hêja û delal, ez ê rabim ji we re xwarinekê çêkim, di jiyana xwe de, we bi çavan nedîtiye ne jî we xwariye, xwarineke gelek xweş û paqij û temîz e, hûn ê tiliyên xwe pêre bixun!!...

Me dilihayî li dayika xwe temaşe dikir ka bê ewê çi bike û çilo wê xwarina salixdayî çêke. Dayika me Ard dixiste legenê, av berdida ser, dikire hevîr û ew hevîr baş distira, paşê wê ew hevîr dikire girêk, li ser textekî, bi teşiyê ew girêk tenik dikir ta weke pela sîrê dibû, paşê bi kêrê, ew terîş terîşî dikir, û ew terîş li ber tavikê datanî ta hişk dibû. Ji nû ve ew dixiste teştê û li ser agirê tifikê diqeland û sor dikir…Bi nazikî ew dixiste beroşê û kelek didayê, paşê ew rûn dikir, û çend lib hêk jî dixiste nav û li ber me datanî.

Em lê dipiçikîn, dibû şinge-şinga kevçiyan û qîje-qîja birçiyan. Yekdido, me di binê firaxê de bang dida!!. Piştî ku me zik dikire dahol; Em li dayika xwe dizîvirîn û dipirsîn, bê ka navê vê xwarina xweş çî ye!?. Dayika me dest û devên me dişuştin û digot: "Lawo, navê vê xwarinê **Rişta** ye".

Bi rastî, ew xwarineke gelek xweş bû, ta niha, xweşbûna wê di bin zimanê min de ye û ez wê ji bîr nakim.

www.arsivakurdi.org

# Kongirê – 6-an li kê pîroz be ?

**Enehîte Mored**

Li dawiya çiriya paşîn, partiya me ya pîroz yekîtiya demiquras a Kurd li Sûriyê (Yekîtî ) kongirê xwe yê şeşan -- -weke her car- bi rêkûpêk di bin siya dirûşimên şaristanî û balkêş de lidarxist. Piştî bidawîkirina kongir û derketina daxuyanê; Em bi navê xwe û rêxistina jina Kurd li bajarê Helebê, kongirê şeşan li hemû heval li der û hundir welêt pîroz dikin. Hêvî û armanca me ew e ku , hemû hevalên partiya, me nemaze komîtên berpirsiyar , biryar û dirûşimên kongir û nemaze yên di warê rewşa jinan de, ji bîra nekin . Pêwîste ew di xebata xwe ya rojane de, lê xwedî derkevin. Ji ber ku dirûşima ku jin nîvê civakê ye û perwedekara nîvê dî ye- ango can û giyanê jîyanê bi xwe ye- ne wilo?. Û ev rastiya nemîne dirûşime û henek û hew. Lê mixabin, ev dirûşimên ji vê rengî tenê di civat û boneyên partî de têne hlidan . Pişt re zû û pir bi lez ji bîr dibin ! Bêgûman ev rûdawa di nava partiya me de û belkîm jî kêm – zede li ba baskên dî ji tevgera me ya niştmanperwer, ne nîşana xêrê ye ?. Li vajayî wê, nîşana nezanî û paşmayîn bi xwe ye . Ma gelo, kî nizane ku , rêxistina jinan di nava tevgera Kurd de -nemaze di nêv partiya me de- serdestiya xwe cî negritî. Sedemên vê yekê jî gelek in : Em bi kurtebirîn dikarin bêjin :

- Ligel ku em di sedsala bîst û yekan de ne , hêjî em di bin bandora gerdîşên civakî yên pûç û vala de vedigevizin û li ber xwe didin . Lewre jî , hemû sûc û gunehkarî di sukira mêran de ye, ji ber ku , mêr serdar e û di her warî de xwedî biryara dawî ye.Vêca jî egr em li dawiya salên Heştê ta navîna salên Nodî weke nimûne vegerin û li dîroka rêxistina jinê temaşekin ; Em ê baş têbigehên ku çima rêxistin di nava partiya me de geş bû û roj ji rojê hewş vedida. Bêgûman bersiva vê pirsê hêsan û zelale?. Di wê demê de , hemû pirojeyên partî , berên xwe dabûn Markisiyê . Loma jî , kêm-zêde baweriya hevalên mêr bi xebata jinê di nava tevgerê de bilind bû . Piştî hevgirtina Sofiyet hiliweşî û heyama Markisiyê nema ; pêre –pêre jî pir bawerî û nêrîn hatine guhartin. Yek jê baweriya hevalên me bi xebata jinê kêm û qels bû ! Ma xwendevanên vê nêrînê çawa dibînin!?. Bi ya me be , ev yeka ji sedemên bingehî ne ku , îro hevalên (peya- zilam) -nemaze yên di komîtên berpirsiyar de dixebitin- , wan pişta xwe dane rewşa jinê, û ne xemxwer û berketiyên nîvê civaka Kurd in .Belam tenê ew dirûşimên mezin û balkêş hildidin ta ku , kêmasiyên xwe ya heyî veşêrin û bi rûkî şaristanî xwe li pêş raya giştî li der û hundir welêt nîşan bidin . Weke pêşiyên me gotine : Dikale lê şîr nade . Li dawî weke têbîn û dilxweaziya me piştî kongirê -6- an û bi sala nû re heval tev baweriya xwe bi xebata jinê geş û bilind bikin , rê li pêş keç , jin û xweîşkên xwe vedin û dûz bikin .

**sersala we pîroz be û nîşana we demikrasî û wekihevî be**

www.arsivakurd.org

# Denazana Şamê nemana xwe da piş xwe û berê xwe da manê

**Mem Alan**

Piştî girtina /12/ kesan ji serkirdayatiya Danezana Şamê ji aliyê hêzên ewlekariyê ve , zora hatiye ser wê , û hewildana rijêmê ku , danezanê tune bike; Tirsek li ba hemî piştgir û dostên wê peyda bû ku , belkî tune bibe û were herifandin yan jî bi kêmanî ji armancên wê bê yaldan . Û hin endamên wê ji tirsa xwe re ji riya girtine derkevin.

Lê tiştê bûye bervajî wê nêrînê bû. Danezanê bi siyaset û helwestek li dûzan , pîvayî ,ne hezhezokî ,û bê zêdekavî an kêmgavî xebata xwe berdewam kir û rêça xwe ya mandinê qelaşt. Ji alîkî ve, di hemî bûyeran de , xwedî nêrîn û helwest bû, herweha li hemî bajarên hundir sûriyê û welaten ewropî ku , - lê heyî-, wê dest bi avakirina şaxên xwe kir, û li vê dawiyê rûniştina li Almaniya bo avakirina şaxekê li wir jî mênakek bû. li gel wê pêrabûna bi gelek çalakiyan li derve , di çarçewa hevdîtinan de, bi hin aliyên sêvîl yên. Ewropî re , û beşdarbûna li gonfiransên ji bo mafên mirovan li Sûriyê hatine girêdan mênakek dê bû. Herwiha tiştê tewrî balkêş, ronak û mirov pê serbilind dibe , berxedana girtiyên Danezanê yên ku , bihna siyasetek pîvayî û bê tu veger ji armancên Danezanê di zîndanê û li pêş dadgehê de. Ta radeya ku , ji aliyê dadgehê ve ,bi hirhitandina avakirina dewleteke netewî Kurd li Sûriyê hatin gunehkar kirin .

Ew berxwedana dihêle û wê her bihêle ku, temenê wê dirêj bibe. Wê lomê jî, me got Danezana Şamê berê xwe daye manê .

Vêca gereke herkesekî welatperwer û xêrxwazê vî welatî û gelên wê , û bi taybetî gelê me yê Kurd li dor Danezanê bicive û lê xwedî derkeve. Ji ber ku ev tar û çembera yekemîne li Sûriyê , piraniya gelên Sûriyê dide ser hev û di hindir xwe da dicvîne, û li pirsa Kurd li Sûriyê dibe xwedî

**Dumahhîk : Fermana "49"an**

daye zorker û çavsorên ku her dem û gav gelê me riswa dikin, werîsê mirinê li stuyê wî badidin û berê xwe dane hev, şer û berberiya kevnar ya sedên salan dikin..!!. Ma gelo di siha vê êrîşa hovane de, dema vê devavêtin, pevçûn û berberiya xwexwetî ye..?!!.

Em armancên van ton pilanan baş dizanin û nas dikin, ew dixwazin em ji welatê xwe derkevin û xaka xwe bi wan bihêlin da ew xêr û bêra wê bixun. Lê, ew ê vê xewnê nebînin û di vê pilana xwe de jî têk herin. Ji ber ku gelê me asê bi xaka xwe ve girêdayî ye, tucarî ew ji welatê xwe, welatê bav û kalên xwe nagere û wî di destê xelkên de nahêle. Rast e ku, ew bi van pilanên ne mirovane têşe, baca wan bi giranî û buhayî dide jî, lê, ew welatê xwe bernade. Ji ber ku welatê wî di hiş, dil û canê wî de cihê herî mezin, berz û bi rûmet girtiye.

**Şam 11.11.2008 Z-2620 K**

www.arsivakurdi.org

**Dumahîk : Daxuyana dawî ....**

bi ser de jî , berdewamiya karbidestan di bikaranîna tevdîr û qanûnên awarte û nijadperest de , û li pêşî , piroja serjimartina setemkar 1962 , tevî ku sozên dubarekirî ku - xwedêgiravî – lêvegerek bibe û ji ortê rabe .

Ji bilî piroja kembera erebî ya kirêt li despêka salên heftiyan , bi ser de jî li vê dawiyê , derçûna fermanên nû ku hê bêtir desthilatdarî di hemî waran de , di destê hêzên parastinî de be , û rê li ber pêvajo û çalakiyên aborî , bazirganî , kirînfirotana cîgeh û avahiyan teng bibe û bête girtin , nemaze rol û kartêkirina fermana /49/an 2008 an a ku ziyanê dighîne hemiyan û bi taybetî herêmên kurd . Lewre jî , kongirê da xuyakirin ku , ev ton fermanên he , ne tenê bona kurdane û hew , lê belê bona jiyan û pêşeroja gelê Sûrî serûber , nerindî bi xwe ye . Loma jî , pêwîstî li ciye ku , hewildan û çalakî li gel hemî hêzan bidomin , bona berçavkirina ziyan û nerindiyên wan fermanan , da ku lêveger çê bibe , ta ev ferman ji ortê rabin .

**H**erweha , kongirê bi pesindarî , li rol û xebata Encûmena giştî dinihêrî , nemaze ast û pêşeroja wê ya demokratîk , digel Encûmenên herêman li seranserî welêt , evên ku di siha Encûmana giştî de kar dikin , bi hêviya ku bi roleke erênî û berpirsiyar , gav li ser riya lidarxistina kongirekî niştimanî kurdî bi beşdariya camêrên nepartî li Sûriyê bêne avêtin , da ku nûnertiyeke kêrhatî , ku bibe lêvegereke niştimanî kurdî , ku di çerçewa yekîtiya Sûriyê û pêvajoya wê ya şaristanî de , mafên netewî bona gelê kurd û (Îdara Zatî) ji herêmên kurd re bidestxîne , û xwe di ser xirecira partîtî û zarzimanê durişmevaniyê re bigre û jê bidûrkeve .

**L**i hêla dî , hate dîtin û nûkirin ku xebat û hewildanên bona lidarxistina kongirekî niştimanî Sûrî giştî , her li cî ye , û gotûbêj di vî warî de berdewam û li saz be , bona şirovekirina rewşên Sûriyê , bi beşdariya hemiyan , bê ku kes bête bi dûrxistin , nejî , li gor aliyeke yekane be . Şêweya aşkere , berçav û rû li rû , bingeh be , dûrî reşî û tariyê be .

**D**i warên kurdistanî û netewî de , kongirê didît ku , herdu hikûmetên Anqerê û Tehranê di bin perda (li dij teror û cudaxwazan) tepsandin û perçiqandinê di derheqê Kurdên sivîl de didomînin , û di derbarey pirsa kurd de bêçare dimînin , nikarin bi hawakî şaristanî , xwe nêzî pirsê bikin , her û her di wê paşverûtî û hiştengiya xwe ya dîrokî de mane . Û dihate dîtin ku , têgihaştina siyasî û hişyarbûna demokratîk , li ba hêz û rêxistinên siyasî û rewşenbîrî , çi li kurdistana Turkiyê , ya Îranê û çi li derve , li xerîbiyê , her diçe zengîn dibe û pêş dikeve . Li hêleka dî jî kongirê didît ku , hê gelek pirsgirêk di navbera hikumeta herêmî ya kurdistana Îraqê û hikumeta Navendî de , bêçareserî , li holê û lidarin . Lewre jî , pêdivî her ewe ku , ev serpêhatiya ferderalizmê li kurdistana Îraqê bête parastin , digel û di çarçewa pêşketin û pêvajoya jiyana siyasî li seranserî Îraqê , bona xêr û xweşiya hemiyan , dûrketin ji nexweşî û rûdanên biv .

**H**erweha kongirê bi erênî li pêşketina guhdana cîhanî li pirsa demokrasiyê ,

**D.R (11)**

www.arsivakurdi.org

**Dumahîk : Daxuyana dawî ....**

mafên mirovan , têkoşîna li dij toximperestî û îşkencê dinirxand , nemaze başbûna rola gelek kitleyên perlomenter li gelek welatan , rêxistinên civaka sivîl , mafên mirovan , sazî û rêxistinên neteweyên yekbûyî .

Li dawî , weke çawa kongirê bi rawestina bihneke bêdengî bona bîranîna Şehîdan , dest bi kar û barê xwe kiribû , û silav ji hemî rêxistin , dost û hogirên partiyê re , li hundir û derve rêdikir , wehajî nûneran karê xwe bi helbijartina komîteyeke serkirdayetiyê bi dawî anîn , digel soz û peymana hemiyan , ku bi dilsozî , li gor siyaset û şana partiyê , tozika hundirî , dê xebatê di siha durişmên kongir , evên he de bidomînin . Ji bo:

- ✓ **Nûjenkirina jiyana hundirî ya partiyê û xurtkirina cîgeha wê di nav gel de**
- ✓ **Lidarxistina kongirekî niştimanî kurd li Sûriyê .**
- ✓ **Lidarxistina kongirekî niştimanî Sûrî tevahî .**
- ✓ **Têkoşîn li beramber hemî şêweyên tepsandin û zordariya li dijî jinan .**
- ✓ **Parastina zimanê kurdî û berxwedan di ber de .**
- ✓ **Azadî ji girtiyên Danezana Şamê û hemî girtiyê siyasî û xwedî nêrîn .**
- ✓ **Sûriya welatê hemiyan e .**

5 Berçille 2008 an <u>Werger ji zimanê erebî</u>

**Komîta serkirdayetî ya**
**Parta yekîtî ya demokrat a kurd li Sûriyê**

**Dumahîk: Tewana Kuştinê...**

ew kuştî û belkî kuştar jî têkildarê wê partiyê ne. Û ji ber ku rastiya lêkolînên li derbarî wan tewanan ta niha nehatine diyarkirin , destlat jî wan diyar nake û wê wek tiştekî nepend dibîne. Loma jî, welatî neçar dibin sê aliyan têxin nav kevanên gunehkariyê (sîxurên asayişên dewleta Sûryayê , Tirkiyê û PKK bi xwe jî), û wan hemiyan bi lihevxistin û nerawestkirina civaka Kurd gunehbar dikin.

Li roja îro -piranî -eger em nebêjin hemî bûyerên kuştina mirov li civaka me li ser çend bingeh û egerên serekîn radibin: Nezanî, Bêkarî û Xizanî. Ew rûdawa hovane li ser van hersê stûnên paşdemayînê radibin û di wê heyamê de geş dibin.

Lê dîsa û tevî her tiştî, hêvî ew e, ku destlat û dezgehên wê yên dadweriyê bi şêweyek îjdil bi erkên xwe yên rast û dadmend rabin û her kuştarekî û her mijarekê bi riya zagonê bidin ber xwe.

Hêvî ew e jî, ku rojekê pêş de şêweyên kar û zagonên dewletê yên kevin û ne dadmend yên keneperest werin guhertin û li gor rewşên demê û pêşdeçûna şaristaniyê werin nûjen kikin.

Em di wê baweriyê de ne, ku eger gunehê mirovekî çi be, hîç çê nabe ku jiyana wî wilo bi hêsanî, xwînsarî û bê dadkirin were tunekirin. Û eger sedem û behane jî çi bin, dîsa hemî cureyên tunekirina jiyana mirov cihê rûreşkirin û şermezariyê ye û gereke her kuştarek bighê ber dadgehek dadmend û sezaya xwe li gor kiryara xwe ya qirêj bibîne

www.arsivakurd.org

# Fermana "49"an
# Kula ser kulan…!!!

**Rêberê Silîvî**

Tevî ku piraniya salên me Kurdan tal û ne xweş in, ji ber ku ew bi kul, derd û êş di ser me re derbas dibin. Lê belê, sala 2008an, di dîroka gelê me yê Kurd de li Sûriyê, bi gelamper û ya xelkên me yên **Cizîrê** bi taybetî, saleke reş, çift û bê qidoş e…!!.

Di welatê me **Sûriyê** de**, Devera Cizîrê** maka xêr û bêr û çandiniyê ye. Ji ber ku, ji hêlekê ve xaka wê têr û zengîn e, û ji hêla din ve, li zivistanan, berf û baraneke giran dikeve, Buhareke xweş û gulgulîn bi şûn xwe ve tîne, û xweşî û bextiyariyê bi ser xelkên wê de dirijîne. Lê mixabin, sala 2008an, saleke hişk û ziwa bû, genim, ceh, nok û nîskan kat nedan û ew di bin axa xwe de mirin. Gelş û geya jî li bender, best û hewîngan şîn nehat, pez, sewal û dewar jî, ji ber tunebûna çêrê birçî û sifîl bûn. Ji neçarî û tunebûna êm, gundiyan ew firotin, di gundên xwe de, ew bê mast û sipî man…Bi kurtî, mirov dikare bibêje ku di vê salê de, xelkên devera Cizîrê bi Ereb, Kurd, Asûr û Ermenên xwe ve, ketine destengî û astengiyeke aborî ya dijwar …

Li şûna ku destelata Sûriyê destê alîkarî û yarmetiyê dirêjî welatiyên xwe bike, bi hawar û gaziya wan ve here, derd û kulên wan sivik bike; Ew bi du kiryarên pir xirab rabûye û ben li stuyê wan tengtir kiriye, ew jî ev in:

1- Wê buhayê firotina "Mazotê" 3 qatan bilind kiriye, û buhayê hemî meteryalan"Mewadan -şênberan" pêre giran bûye.

2- Wê fermaneke nijadprest malwêrane dijî gelê Sûriyê derxistiye. Li gora vê fermanê, mirovê Sûriyê di kirîna xanî, milk, dikan û xaka çandiniyê de ne mafdar e…!!. Ango, eger hat û mirovekî xaniyek ji xwe û zarokên xwe re li deverekê kirî, li gora vê fermanê, ew xanî li nik dewletê, li ser navê wî qeyd nabe..!!.

Ji ber vê fermana tixumperest, karê avakirina avahiyan di deverên ku ew ferman lê tê mişandin de bi yek carê hate rawestan, ziyaneke mezin gihişte jiyana xelkê, bêkarî, xizanî û perîşaniyê li her cih û warî konên xwe yên reş vegirtin, û şîn kete her malekê ji wan deveran . Di encam jî de, ji dest rebenî û neçariyê, gelek malbatên Kurdan gundên xwe, xaka bav û bapîrên xwe berdane, li derdora bajarê Şamê cîwar bûne û hin ji wan jî, li derveyî welêt, li biyaniyê penaber bûne…

Mixabin, ku di rewşeke wiha de ku gelê me yê Kurd li Sûriyê bi agirê şovenizmê tê birajtin, ketiye ber şek û pekan û ji ber pilanên zikreşan dikale û dinale, û rehên wî ji kokê ve têne birîn. Û tevgera me ya netewî aya Kurd bi hilwesteke ne berpirsiyar têkiliyê bi vê dozê re dike û tiştê jê tê xwestin nake. Wê pişta xwe

D.R.( 9 )

***Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de***

www.arsivakurd.org